*e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi/Journal of Oriental Scientific Research (JOSR)*
*ISSN:1308-9633*
*Aralık-2019 Cilt:11 Sayı:3 (25) /December - 2019 Volume:11 Issue:3 (25) Sayfa:1454-1470*

# YEK JI NIMÛNEYÊN EWIL YÊN XÊZEROMANÊ DI EDEBÎYATA KURDÎ DA: *MIRINA JARO*

**İlyas Suvağci[*]**

## Kurte

Di serê sedsala 20'an da nimûneyên ewil yên xêzeromanan li Amerîkayê tên weşandin. Piştre di demeke kin da ew li welatên din belav dibe û ji vî cureyê nû gelek dihê hezkirin. Piştî 100 salan em di edebîyata Kurdî da mînakên xêzeromanên ewil dibînin. Berhema Alî Husên Kerîm ya bi navê *Mirina Jaro* yek jî mînakên ewil yên di xêzeromana Kurdî ye; lewma ev lêkolîna me li ser vê berhemê kirîye girîng e. Me ji bo vê yekê bi rêbaza lêgerîna çavkanîyan li ser rojname, kovar û berhemên din yên Kurdî lêkolîn kir. Me pêşîyê li ser dîrok û geşedana xêzeromanê agahî dan. Piştre bi kurtayî nimûneyên xêzkirin, xêzewêne û karîkaturê yên di çapemenî û edebîyata Kurdî da (Kurmancî, Soranî û Zazakî) vekola. Me di dawîyê da jî *Mirina Jaro* di çarçoveya van taybetmendîyên xêzeromanê da nirxand; bûyersazîya wê çawa ye, wekhevî û cudahîyên wê li gor xêzeromanên din çi ne, hêmanên ziman, zeman û mekanî çawa hatine bikaranîn. Me dît ku di *Mirina Jaro* da hêmanên sereke yên rêbaza xêzeromanê nehatîne bikaranîn. Lewma ew ji xêzeromanekê zêdetir wek îlustrasyonekê ye, ji alîyê dîtbarîyê ve jî wek pirtûkeka zarokan ya biwêne ye.

**Bêjeyên Sereke:** Xêzeroman, Xêzeromana Kurdî, Mirina Jaro, Karîkatur, Karîkatura Kurdî

## ONE OF THE FIRST EXAMPLES OF COMIC BOOKS IN KURDISH LITERATURE: *MIRINA JARO*

## Abstract

First modern comic book works have been published in the early 20th century in America. Then spread to other countries in a short time and this new genre becomes so popular. The first works of modern comics in Kurdish literature emerged 100 years later. One of the first examples of comics in Kurdish is Ali Husen Kerim's *Mirina Jaro*. In this regard, we think that this work is worth to study. For this purpose, we have searched Kurdish newspaper, magazine and other works by using source search method. Firstly, we gave information about the history and formation of comics. Then, according to three Kurdish dialects (Kurmancî, Soranî, Zazakî), we briefly examined the drawing, drawing art and cartoon samples in Kurdish literature and press. At the end, we analysed the *Mirina Jaro* in terms of comic book features; how the its plot is, how can it be evaluated in terms of features of comic book, its similarities with other comic

Article Types / Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi: 26.08.2019 Accepted / Kabul Tarihi:21.12.2019
Doi: 10.26791/sarkiat.610864

[*] Dr. Öğr. Üyesi, Hakkari Üniversitesi, Rektörlük, Türk Dili Birimi, ilyascembeli@gmail.com
ORCID ID: 0000-0001-6409-1229

books and what are the differences from them, how language, space and time were used. We have found that the basic elements of comic theory were not used in *Mirina Jaro*. So it's more like an illustration or a picture book for children than a comic book.

**Keywords:** Comics, Kurdish Comics, *Mirina Jaro*, Caricature, Kurdish Caricature

## DESTPÊK

Di nav şaxên hunerê da dîroka xêzeromanê xwe dispêre yekîtîya xêz û nivîsê. Weku hunereka pirhêl têkilîya xêzeromanê ligel karîkatur, xêzeçîrok, sînema û qadên dî yên xêz û nivîsê ra heye. Ji bo ku em taybetîyên xêzeromanê baştir fêm bikin divêt pêşîyê em li çavkanîyên wê binêrin. Herçiqas hinek lêkolîner (Baykuş, 2016:7); weneyên şikeft, goristan, zinar û mermeran, hîyeroglîfên (wênenivîs) Misirîyan, xalîçeya dîwarî ya bi navê Bayeux[1], guldankên Yewnanan, wêneyên stûna Traianus[2], neqşên dîwar û binbanên dêrên serdema navîn, neqşên pirtûkan wek çavkaniyên ewil yên xêzeromanan binirxînin jî, li gorî me, ev ne xêzeroman in, ji ber ku derketina xêzeromanê bi çapxaneyê ve girêdayî ye. Ango, cudahîya herî mezin ya xêzeromanê ji wan çapkirina wê ye. Xêzeçîrok, vegotina çîrokên ku ji çar yan jî zêdetir rêzewêneyan e ku ew di rojname û kovaran da hatine çapkirin û berdewamîya wan heye. Xêzeroman, herçend ku ji xêzeçîrokan derketîbe jî, piştre bi serê xwe bûye navgîneke ragihandinê ya girseyî (Tuncer, 1993:28). Ji ber ku di destpêkê da xêzeroman nêzîkî karîkaturê û herwiha mîzahê jî bû; li beramberî xêzeromanê li Amerîkayê *Comics* û li Îngilistanê jî *Funnies* hatîye bikarînan. Carinan ji xêzeromanê re “romana sînemayê” jî dihê gotin. Ev yek herçend ku binavkirineka populer jî be ew ji ber nêzîkbûna xêzeromanê li vegotinên sînemayê ye. Lewma di navbera xêzeromanê û sînemayê da danûstandinên wek; bikarînana rengan, jevqetandina bûyerê sehne bi sehne, bihêzkirina bergehê bi guhertina honakê, dîmênên ku hêdî hêdî nêzîk dibin, lîstîkên ronahîyê yên li ser kûrahîya hundir hene (Cantek, 2014:24).

Xêzeroman (ing: comic book, tr: çizgi roman) hunereka vegotinê ye ku ji du hêmanên sereke yên ji hev cuda; nivîs û xêzê pêk dihê. Di vê vegotinê da ew wêneyên ku bi destan hatine xêzkirin di nav berdewamîyekê da li pey hev dihên û bi nivîsê ra yekparebûnekê ava dikin. Lewma xêzeroman bi pêşkêşkirina rêzewêneyên ligel nivîsê pêk dihê. Ji bo ku mirov wêneya di nav çargoşeyê da têbigihe divê li nivîsê jî binêre. Nabe ku nivîs bêyî wêneyê bê dayîn. Her wiha ger nivîs nebe wêne bi tena serê xwe nabe xêzeroman. Lewma wesfa vegotinê ne bi tenê dîtbarî ye. Li gor çîroka dihê behskirin carinan xêz carinan jî nivîs derdikeve li pêş lê dîsa jî ji bo şopandinê, vegotina bi xêzkirinê ji nivîsê hêsantir e. Xêzeromanên ku ji alîyê honakkirinê ve serkeftî bûne vê yekê bi pêşxistina xêzkirina berdewamîya navbera çargoşeyan pêk dihînin. Li hember vê yekê ger nivîs li pêş be berdewamî û şopandina navbera wêneyan kulek dibe (Cantek, 2014:21-23). Di têkilîya navbera wêne û nivîsê da ya rast ew e ku bi awayekî maqul hevkêşîyek û hevgirtinek hebe. Her çalakîya hunermendê xêzeromanê bi şirîkatî û alîkarîya xwînerî digihe armanca xwe. Wate, xêz û nivîs bi hewldana xwînerî digihe hev. Wexta xwîner li xêz û wêneyan dinêre di zêhna xwe da wan tewaw dike. Têdigihe

[1] Li ser vê xalîçeya ku sala 1080’an (P.Z.) da hatîye ristin behsa şerê navbera Normanan û Îngilîzan dihê kirin. Bnr. (Gameson, 1997: 109)

[2] Stûn sala 113’ê (P.Z.) hatîye çêkirin. Li ser stûnê şerê qeyserê Romî Traianus li hember Dacia’yê hatîye teraşkirin (Bnr. Speidel, 2004: 3).

ku di navbera her çargoşeyeka xêzeromanê têkilîyek heye û bûyerên tê da hatine xêzkirin yan jî wênedarkirin li gor pergalekê hatîye rêzkirin. Ev yek hêmana herî sereke ya xêzeromanê ye (McCloud, 2017:68).

Dema em bi giştî li navkirinên xêzeromanê binêrin, em ê tê da van binavkirin û cuyerên wê bibînin; xêzeçîrok (graphic novel), şirîtên karîkaturî yên rojnameyê (newspaper strips), karîkaturên bi yek panelî yên ku tê da rêzikek nivîs cih digire (single-panel gag cartoon), xêzeromanên lehengên derasayî (superhero comics), xêzeromanên înternetê (web comics), xêzeromanên japonan (manga), xêzeromanên nepenî (underground comics), xêzeromanên alternatîf (alternative comics), xêzeromanên kowboyan (western comics) hatîye binavkirin (Bıçakçı, 2018:45).

Ger em xêzeromanan li gor naverokê dabeş bikin, em dikarin behsa cureyên wek; pêkenî, serpêhatî (macera), seks, sîyasî û klasîk bikin. Bi bawerîya H. Jürgen Kagelmann, sînorê dabeşkirinê li gor naverokê tune ye lewma divêt em li gor tesîra ruhî wan wiha bisenifînin; xêzeromanên ji ber rageşîyê atmosfera serpêhatîyê (macera) ava dikin, xêzeromanên ji ber şahîyê atmosfera pêkenîyê ava dikin (vgz.Tuncer, 1993:30). Bi bawerîya Nilüfer Tuncer'ê jî herçend ku ev dabeşkirina Kagelmann maqul jî be ji ber ku behsa klasîkan nahê kirin ev ne têkûz e (Tuncer, 1993:30). Her wiha êdî li gelek welatan xêzeromanên ku rexneyên polîtîk û civakî dikin, rasterast xitab li ramanê dikin tên çapkirin. Wek li jor jî me dîyar kir, xêzeroman xwedîyê rêbazên vegotinê yên xweser in û şaxeka hunerê ya resen e. Ew, danezana xwe bi rêya sehneyên li pey hev hatî, radigihîne. Ji bilî wêneyê hunerên wek; wêneyên perçivandî (cartouche), wêneyên dîwaran (fresk), wêneyên camê (vitray), wêneyên pirtûkan (minyatur), wêneyên kolandinê (gravur) ev şêwaz bikar anîye (Gündüz, 2004:10).

Çawa ku li jor têkilîya di navbera xêzeromanê ligel karîkatur, xêzewêneyê jî hat dîyarkirin nimûneyên ewil yên xêzeromanê ji karîkatur û xêzeçîrokên ku di rojname û kovaran da hatine çapkirin pêk tê. Cara ewil di sedsala 18an da li Îngilistanê wênesazê bi navê William Hogarth xêz û wêneyê digihîne hev û xêzewêneyan xêz dike. Peyva "Cartoon" (xêze-wêne) cara pêşîyê bo van wêneyan hatîye bikarînan. Xêzeromanên modern jî cara ewil di dawîya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an da di rojnameyên Amerîkî da dihên çapkirin. Ji ber ku wê demê li Amerîkayê xwendin û nivîsandina koçberan kêm bû çapemenîya Amerîkayê, ji bo hejmara firotina rojnameyan zêde bike kêm cih dide nivîsê û zêdetir şirîtên xêzeromanên ku bi zimanê gerdûnî yê hunera karîkaturê hatine nivîsandin bi pêş derdixe (Ertemir, 2011:65). Nimuneya ewil ya xêzeromanê ya bi navê *Yellow Kid* (Zarokê Zer) jî di sala 1896an da di rojnameya *New York World*ê da (li Amerîkayê) ji alîyê Richard Fenton Outcalt ve hatîye xêzkirin. Di vê berhemê da dîyalog li ser cilûbergê zer yê lehengê romanê *Yellow Kid* hatîye nivîsandin. Di sala 1901an da jî di berhema bi navê *Katzenjammer Kids*ê (Zarokên Katzenjammer) da bi bikarînana axaftinên di nav pifdankê da xwîner rasterast pêrgî karakteran dihên, ji gotinên ji devên karakteran derdikevin hayedar dibin. Heta sala 1907an çargoşeyên xêzeromanan bi tenê di nav rojname û kovarên hefteyî û mehane da cih digirin. Piştî vê salê êdî em wan bi rojane di nav rojnameyan da dibînin. Cureya ku da ji xêzeromê kurttir e û jê re *comic strip* (xêzeçîroka biwêne) tê gotin di rojnameyan û bi gelemperî di çar rûpelan da tên weşandin. Nimûneya wê ya ewil ya bi navê *Mutt and Jeff* (1907) li Amerîkayê di rojnameyeka rojane da hatîye çapkirin. Di sala 1919an da Frank King di berhema xwe ya bi nevê Gasoline Alley da cara ewil behsa karakterekî ku di jîyana rojane da xwedî muşkîleyan e. Bi xêzeromana bi navê *Tarzan* (1929) jî cara ewil nivîsên di çargoşeyên xêzeromanan da bi awayekî bipergal li pey hev dihên dayîn. Bi vê

yekê vegotina bi qutîyên xêzikî dest pê dike û vegotina çîroka xêzeromanan digihe şêweyekî nû. Di sala 1933an da li Amerîkayê xêzeromana ewil bi navê *Funnies on Parade* (xêzeromanên li ser merasîma borînê) hatîye çapkirin. Xêzeromana ewil ya ku xwedî materyalên xwerû ye bi navê *New Fun* di sala 1935an hatîye çapkirin (Tuncer, 1993:12-16). Di salên 1940î da belku jî ji ber rewşa Şerê Cîhanê yê Duyem em êdî di xêzeromanan da pêrgî lehengên xwedî hêza derasayî (super hero) dihên. Di sala 1939an da bi *Superman* û di sala 1940î da jî bi *Batman* êdî çanda xêzeromanan ber bi lehengên derasayî ve diçe. Lewma çanda xêzeromanê êdî dikeve li ser rêya du çavkanîyên sereke. Cureyê ewil bi tevahî xwe dispêre rasteqînbûn û dramatîkbûnê. Ya diduyan jî li ser bingeha pênaseya lehengan ava dibe (Seyhan, 2015:9-12). Di qadên wek; perwerdehî, leşkerî, şahî, reklamkerî xêzeroman hatine bikarînan. Wek mînak di Şerê Cîhanê yê Duyem da li Amerîkayê gelek xêzeromanên ku xîtabî leşkeran dikin hatine çapkirin. Ew jî têkiliya weşandina wan û rewşa siyasî, civakî ya demê dide xuyakirin. Di perwerdehîyê da jî xwendekar dikarin mijarên ku têgihiştina wan zehmet e bi rêya xêzeromanan baştir fêmkirin. Mirov dikare bi rêya xêzeromanan wan xwendekarên ku di xwendinê da astengîyan dijîn yan jî di karê xwendinê da nejêhatî ne, ber bi xwendinê ve bibe û tirsên wan ji holê rake (Topkaya, 2014:34).

## 1. Xêz, Wêne û Karîkatur di Edebîyata Kurdî da

Wek li jorê jî hatibû gotin têkiliya wêne, xêzeroman û karîkaturê bi hev du re. Ev hêman jî bi rojnamegerîyê pêş ketine. Ev yek di kurdî de jî tê dîtin. Lewma divêt em jî pêşîyê li rojnamegerîya Kurdî binêrin.[3] Di rojnameya ewil ya Kurdî ya bi navê *Kurdistan* (1898-1902) da em tu wêne yan jî xêzewêneyan nabînin. Di rojnameya *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi* (1908-1909, Rojnameya Alîkarî û Pêşketina Kurd) da wêneyên; Stenbola paytexta Osmanîyan (h.1), Siltan Evdilhemîd (h.1), meclîsa mebûsanan (h.4) dibînin. Piştre bi rêze di kovara *Rojî Kurd* (1913) da wêneyê Selahedîn Eyubî (h.1), Şah Abdulkerîm Xan Zend (h.2), Husên Kenan Paşa (h.3) û wêneyekî Erzurumê (h. 4) dibînin. Di kovara *Jînê* (1918-1919) da jî em bi tenê wêneyê Şerîf Paşa[4] (h.25) dibînin. Di nav rojname û kovarên wek; *Hawar* (1932-1943), *Ronahî* (1942-1945) û *Roja Nû* (1943-1946) da weşana ku herî zêde cih daye wêneyan Ronahî ye. Di Hawarê da wêneyên wek; Kurdmancên Deşta Hesinan (h.9), Xelîl Ramî Bedirxan Beg (h.11), Diktor Ehmed Beyreqdar (h.11), Selahedînê Eyûbî (h.13), Zerdeşt (h.42) hene. Lê di *Roja Nû* û nemaze di *Ronahî*yê da wêneyên balafir û keştîyên şer, fermandar û leşkeran, nexşeyên rêgehên artêşan hene. Sedemê vê yekê ew e ku kovar di Şerê Cîhanê yê Duyem da piştgirîya dewletên "Hevalbend" (nemaze jî Fransayê û Îngilistanê) dike. Di 28 hejmarên *Ronahî*yê da li dora 708 wêne cih digirin û ev yek di her hejmarê da dike 25 wêne (Jiyan, 2010). Di kovara *Ronahî*yê da em wêneyên bi nivîs jî dibînin. Wek mînak di bin wêneya Xoce Nesredîn (h.13) da bi anektodekê behsa êrişên balafirên Îngilîzan li ser Berlînê dihê kirin. Dîsa ligel çîrokên ku bo Kurdî hatine wergerandin wêneyên ku bûyeran vedibêjin hatine xêzkirin. Ew wêneyên ku li rex çîrokan hatine bicihkirin rastûrast ji çavkanîya wergerê hatine girtin. Wek mînak ji kovara Frensî ya bi navê "En Route"yê çîrokên bi navê *Merxwir* (h.15), *Sêhirbaz* (h.16) hatine wergerandin û ligel nivîsan wêneyên ku çîrokê rave dikin jî hatine dayîn. Her wiha çîrokeka Guy De

[3] Sedemên derengmayîna xêzeromana kurdî ji ber heman pirsgirêkên giştî yên rojnamegerî û kovargeriya kurdî ye. (Bnr. Hassanpour, 1997)

[4] Şerîf Paşa ji alîyê *Kürd Teali Cemîyeti*yê ve di Konferans Paris'ê ( 1919) de wek nûnerê Kurdan hatibû wezîfedarkirin. Ji bo jiyan û serboriya Şerîf Paşa Bnr. (Kutlay, 2011:132)

Maupassant bi navê *Cankêş* (h.15) jî bi heman awayî hatîye wergerandin, wêneyê çîrokê hatîye dayîn lê di vê çîrokê da çavkanî nehatîye dîyarkirin. Di hejmara 19an ya kovarê da jî em dîsa ji “En Route”yê bi navê “Çîroka Bêgotin” sê xêzewêneyên bênivîs dibînin. Ev mînakên di Ronahîyê da herçend ku ji çavkanîyeke din hatine girtin jî ew di warê xwe nimuneyên ewil in.

Di salên 1960î da li Tirkîyê di kovarên wek *Dicle-Fırat* (1962-1963), *Deng* (1963) û *Roja Newe* (1963)[5] da em wêneyên li ser jîyana Kurdan û sedemê lipaşmayîna wan dibînin. Di kovara *Tîrêj*ê (1979-1981) da ji ber bandora berîya salên 1980yî û piştî darbeya leşkerî û wan salên “tarî” wêneyên wek; mirovê li ber findekê pirtûkê dixwîne (h.1), du zelamên ku bi hevre rojê digirin (h.2) û bi destnîşana “Mamoste” xêzewêneya zarokê ku bombeyekê vediguherîne kevokeka aşitîyê (h.4) dibînin.

Piştî salên 1970yî li Ewropayê di kovar û rojnameyên Kurdî da em bi awayekî têkûz xêzewêne û karîkaturên Kurdî dibînin. Di kovarên wek; *Rabûn* (1975), *Pale* (1978), *Kulîlk* (1980) *Muzîk û Huner* (1980), *Berbang* (1982), *Hêvî* (Kovara Zarokan, 1981), *Hêvî* (Kovara Çandî, 1983), *Mamosteyê Kurd* (1985), *Kurdistan Press* (1986), *Çarçira* (1986), *Wate* (1987), *Berhem* (1988), *Bergeh* (1989), *Nûdem* (1992), *Çira* (1995), *Dugir* (1995), *Helwest* (1995), *Vate* (1997), kovarên qerfî yên wek; *Îsot* (1985), *Mîrkut* (1985), *Zengil* (1985) û rojnameyên wek; *Armanc* (1979), *Berxwedan* (1983) da em wêneyên bi nivîs, xêzewêne û karîkaturan dibînin. Her wiha du pirtûkên karîkaturan yên bi navê *Dengê Xêzikan* (1984) û *Mêr Mêra Nas Dike* (1993) li Stokholmê ji alîyê weşanxaneya *Jîna Nû* ve hatine weşandin. Navê karîkaturîstî *Mamoste* ye. Piştî salên 1990î da dîsa li Tirkîyeyê li rojnameyên wek; *Rojname* (1991), *Welat* (1992), *Welatê Me* (1994), *Azadîya Welat* (1996) û kovarên wek; *Nûbihar* (1992), *Rewşen* (1992), *Zend* (1996), *Jîyana Rewşen* (1997) û kovarên qerfî yên wek; *Tewlo* (1992), *Pîne* (1999) û *Golik* (2012) ev pêvajo berdewam dike û digihe roja îroyîn. Her wiha li Dîyarbekirê xêzekovara bi navê *Zirîng* ku cih dide beşên karîkaturên bi Zazakî û Kurmancî nû dest bi weşanê kirîye. Edîtorê kovarê Dogan Guzel e.

Di Kurmancî da bi taybetî mînakên xêzeromanan yên Alî Husên Kerîm[6] dihê zanîn. Di Zazakî kovara *Vate* (1997) da Hamdî Özyurt û di rojnemaya *Newepel* (2011) da Mucahîd Baran karîkaturên Zazakî xêz kirine. Di Soranî da jî herçend pêvajoyeke dirêj ya çapemenîyê hebe em ê behsa du kovarên girîng yên karîkaturê bikin. Yek jê li Silêmanîyê di sala 2000î da ji alîyê “Binkey” Çapemenî Taym” ve kovareka bi navê *Tan Tan* dihê çapkirin. Edîtorê wê Bextîyar Mihemed Şerîf e û li ser kovarê dihê dîyarkirin ku ew bo kesên temenê di navbera 10 û 18’an da hatîye terxankirin. Di kovarê da dihê gotin ku nivîsên ji; Îngilîzî, Tirkî, Erebî, Farisî, Swêdî û Almanî werdigerîne bo Kurdî. Di kovarê da xêzeromanên ku li cîhanê herî zêde hatine xwendin yên wek; *The Phantom, Popeye, Little Lulu, The Pink Panther, Tintin* bo Soranî hatine wergerandin. Kovara bi navê *Gep* jî li Hewlêrê di navbera salên 2004 û 2015’an da 171 hejmar hatîye weşandin. Xwedan îmtîyaz û sernûserê wê Mihemed Qadir e. Ew kovareka mehane ya karîkaturan e.[7] Her wiha ev du sal e karîkaturîstên Kurd bi navê “Foruma Karîkaturên Kurdî” organîzasyonekê dikin û ji çar alîyê cihanê karîkaturîstan

[5] Herçend ev kovar bi Tirkî hatibin weşandin jî carinan cih dane nivîsên Kurdî lewma me ew jî xistin di nav lêkolîna xwe da.

[6] *A. Husên Kerîm* bi navê *Mamê Elî* jî berhemên xwe dane û ew nivîskarê *Mirina Jaro* ye.

[7] Ji bo zêdetir agahîyê binêre: http://www.tantan.8m.net (Dema jêgirtinê: 05.07.2019) http://gep-media.net/ (Dema jêgirtinê: 05.07.2019)

da'wet dikin, xelatan didin xwedanê karîkaturên ku di pêşbazîyê da serdikevin û ew berhemên ku pîleyeke baş bidest dixin wek pirtûk dihên çapkirin. (Kolektîf, 2019)

## 2. Mirina Jaro

Berî ku em li ser bûyersazîya *Mirina Jaro* bisekinin pêşîyê em bi kurtayî behsa nivîskarê wê û berhemê wî bikin. *Mirina Jaro* ji alîyê Mamê Elî (Alî Husên Kerîm) ve hatîye nivîsandin. Xêzkarê wê jî Lewend Ozkan e. Ev berhem pêşîyê weku beş di tu rojname yan jî kovaran da nehatîye weşandin.A. Husên Kerîm xêzeromanên wek; *Bazos* (2006), *Keçelok* (2006, îlustrasyon û xêzkêşî), *Mirina Jaro* (2007), *5 Tebaxê* (2010), *Zembilfiroş* (2019, xêzeroman) nivîsîye. Berhema ku me li ser lêkolîn kirîye ya bi navê *Mirina Jaro* ji 156 rûpelan pêk dihêt. Berhem weku destanan hatîye nivîsandin lewma her hevokeka di berhemê da bi 11 kîteyan pêk dihê. Mijara berhemê bi giştî buyerên mîtolojîk ên Rojhilata navîn –ji destana Gilgameş heta Tofana Nuh- di nav xwe de dihewîne. Lewma mirov dikare bibêje ku *Mirina Jaro* ligel berhemên dî xwedîyê motîfên hevpar in.

### 2.1. Bûyersazî

Di berhemê da behsa çend rêzebûyeran dihê kirin. Dilo, Jaro û Lewendo sê birayên pêlewan, xwedîyê şûr û mertalan in. Jaro wek Gilgamêş bi jîyana pir kin û di dumayîkê da mirin heye, qayîl nabe lewma bo peydakirina jîneka bêdawî dest bi rêwîtîyekê dike. Em dikarin bûyerên ku ji destpêka rêwîtîya wî heta dûmahîka umrê wî diqewimin wiha rêz bikin;

1. Jaro pêşîyê pêrgî teyrekê dihê û jê re nîyeta xwe dibêje lê teyr jê re dibê "Heta ku em libê garis bixwin mirin ji bo me tune ye". Jaro bi vê bersivê qayîl nabe, berdewam dike.

2. Marek derdikeve ser rêya wî. Mar jî dibêjê "heta ku em axa til tam bikin mirin ji me re tune ye". Jaro dîsa berdewam dike, digihe çemê Dîcleyê.

3. Di bin avê da kiloxekê dibîne, piştre bi awayekî derasayî ew kilox û hestî bi goşt dihê pêçan, dibe Gilgamêş. Jaro û Gilgamêş bihevre li şopa nemirîyê digerin. Piştî gera heftsed salî gîyayê Homa'yê dibînin û wê dixwin. Heft hezar sal dîyarî li wan dihê kirin.

4. Keçikek bi navê Anahîta[8] Jaro ji Gilgamêş vediqetîne, Jaroyî ber bi evînîyê ve dibe, heft hezar salan bi hev ra dijîn.

5. Tofan radibe, Jaro di keştîya Nûh da dibe mêvan. Wexta rojekê keştî diqelişe, Jaro dibe mar û cihê qelişî pîne dike. Piştî hefthezar salan Keştî li ser çîyayê Cudî rûdinê.

6. Jaro dihê li Laleşê dibe şagirtê Şêx Hadî, *Mishefa Reş* û *Cîlwe*'yê dixwîne. Li vir em hîn dibin ku Jaro bi eslê xwe yekî Êzidî ye û bi xwendina *Mishefa Reş* û *Cîlwe*'yê ew zanista qewmê xwe hîn dibe. Bi Sultan Ezî ra êrîş li Stenbolê dike, sûrên Stenbolê hildiweşîne.

---

[8] Anahîta motîfeka xwedawenda sereke ya gelên Rojhilata navîn û gelên Îranî ye. Ew xwedawenda avê ye, bi bedewîya xwe ve dihê zanîn. Bnr. (Collins, 2001:125; Boyce, 1982:29)

7. Rojekê Jaro dikeve xewekê, wexta hişyar dibe dibîne ku ew hatîye nik Kawayê Hesinkar, bûye şagirtê wî, hînî hesinkarîyê dibe. Wexta Jaro zilma Dehaq hîn dibe, wî dikuje, *mizgîna azadîyê* (r.55) dide Kurdan.

8. Rojekê teqînek çêdibe û Jaro dema hişyar dibe, dibîne ku ew hatîye cem Zerdeşt. Rêhevaltîya Drajmaspa dike û dest bi nivîsandina *Avestayê* dike, *Zend*ê wate dike û dibe pêxemberê Kurdan, ligel Xurmiz li hember Ehrîman şer dike.

9. Piştre Jaro û yazdeh hevalên xwe (hewarî) dihên welatê Îsraîlan û dibin şahidê jidayîkbûna Îsa Nebî. Piştre em dibînin ku Jaro û hevalên xwe doza Îsa Nebî dikin lê di dawîyê da Jaro û Îsa Nebî dihên girtin û bi çarmixan dihên girêdan.

10. Piştî sê rojan bablîsokek radibe û Jaro dibîne ku ew ligel Selaheddînê Eyubî û diwazde hezar siwarîyan li hember xaçperestan şer dikin.

11. Piştî ku Selaheddîn dimire heft perperik Jaro tînin nik Ehmedê Xanî, ew dibe şagirtê Xanî. Li vir bi Bekoyê Ewan ra şer dike, *"fêrî evîna Kurdanî"* (r.81) dibe.

12. Dema ku Jaro li tixûbê Zagrosan di şikeftekê da ji xeweke giran şîyar dibe ji bo peydakirina nemirîyê dîsa dikeve rê, pêrgî keçeka bi navê Dinya dibe. Dinya jê ra dibêje, heke Jaro hejê bike ew ê sêhra nemirîyê bide wî lê divê ew malbata xwe, jîyana xwe ya berê ji bîr bike. Jaro jî vê yekê dipejirîne. Ew gelek roj û şevan bi kêfxweşî derbas dikin heta ku rojekê Jaro ji Dinyayê ra dibêje ew dixwaze vegere nik malbata xwe. Dinya sê sêvan dide Jaro, bo ku bikare here nik malbata xwe û dîsa vegere.

13. Piştî demeke dirêj Jaro dihê welatê xwe Cizîrê, pirsa malbata xwe dike. Kalek jê ra dibêje birayê wî Dilo, ji ber bêbextîya jina xwe êrîş li birayê xwe Lewendo kirîye. Lewendo dikeve nav çemê Feratê, jinên Ereban wî ji çem derdixînin, birînên wî cebar dikin. Demeka dirêj derbas dibe, rojekê talanek dihê ser êla Ereban, Lewendo bi tenê talanê dişikîne. Şêxê Ereban ji lehengîya wî dikeve şikê, jê dipirse, çîroka wî hîn dibe, wî tîne Cizîrê. Ji Dilo ra behsa bêbextîya jina wî dike. Dilo jî hay ji rastîyê dibe û jina xwe dikuje.

14. Wexta Jaro çîroka birayên xwe hîn dibe digirî, dibîne ku ji jîyana wî ya berê tiştek nemaye, dixwaze vegere nik Dinyayê. Di rê da melkemot dikeve dirûvê kalekî, ji bo sêvekê dike nalenal. Dilê Jaro pê disoje sêvekê dide wî. Ji sê sêvan yek dimîne[9]. Melkemot dikeve dirûvê teyrekê, êrîş dike, çavê hespê Jaro kor dike. Jaro û hespê xwe dikevin di nav avê da. Melkemot sêva dumahîkê jî ji destê Jaro digire û ruhê wî distîne.

Di dawîya pirtukê da dihê gotin ku zagona herî rast ya jîyanê ew e ku "Wê her ruh li mirinê tam bike" (r.156) Lêgerîna Jaro ya li nemirîyê bê encam dimîne û nivîskar dixwaze bibêje ku çareyek yan jî rêyek bo nemirîyê tune ye.

## 2.2. Nirxandina Mirina Jaro li gor Qayîdeyên Xêzeromanê

Nirxandinên xêzeromanê piranî di çarçoveya hêmanên; *dabeşkirina çîrokê, rûpelsazî, darêjnivîsa panoyan û şêwekarî* tên kirin. Me ev hêman ji lêkolîna Nilüfer Tuncer'ê

[9] Derbarê seva din da behs nayê kirin bê ka çi lê hatîye.

girtin. Bi bawerîya me jî ev hêman him ji alîyê naverokê him jî alîyê teşeyî ve rê dide me ku em çu hêmanan ji derveyî lêkolîna xwe da nehêlin; lewma em ê pêşîyê derbarê van hêmanan da ji berhema N. Tuncerê çend agahîyan bidin û piştre li gor qayîdeyên hatine dîyarkirin *Mirina Jaro* binirxînin.

### 2.2.1. Dabeşkirina Çîrokê

Her parçe yan jî wêneyekî xêzeromanê tevgera yan jî beşa berîya xwe bi bîr dixe. Li hember wan dabeşkirinan ew xêzeromana ku bi awayekî herikbar behsa çîroka xwe dike serkeftî ye (Tuncer, 1993:43). Di *Mirina Jaro* da wexta nivîskar dixwaze di heman demê da behsa gelek bûyeran bike û panoramayeka ji dîroka Kurdan pêşkêş bike ji ber tengbûna sînorê xêzeromanê nikare ji bin vî barî derkeve. Vê yekê, aksîyona berhemê têk birîye lewma xwîner ji bîr dike ka gelo berê behsa çi dihat kirin. Carinan jî ev ji ber nakokîyên di berhemê da pêk dihê. Wek mînak, Jaro li rexekî ligel 12 hewarîyan doza Îsa Pêxember dike li rexê dî ew ligel Selahedînê Eyûbî li hember xaçperestan şer dike. Ew jî nîşan dide ku di berhemê da di têkilîya mantiqî ya navbera lehengan û bûyeran da pirsgirêk heye.

Ji ber ku *Mirina Jaro* wekî destanekê hatîye honandin nivîskar pir bala xwe nedaye ser kesayetîya Jaro. Di destanan da ji çîroka karekterekê zêdetir mebest bûyerên civakî, dîrokî û kolektîf e. Ji ber vê yekê xwîner ji kûrahîya gîyanî ya Jaro û karakterên din hayedar nabin. Lewre ew; tengezarî, dilxweşî û xemên karekteran parve nakin. Di berhemê da karakterên ji bilî Jaroyî bi gelemperî bi alîyên xwe yên dîrokî û mîtolojîk derdikevin pêş. Rêwîtîya Jaro û lêgerîna wî ya li nemirîyê, vediguhere fêrbûna rêwîtîya qonaxên girîng yên dîroka Kurdan. Lewma lêgerîna Jaro li nemirîyê honaka çîrokê ya bingehîn nîne. Ew bi tenê wek hêmaneka alîkar hatîye bikarînan. Ji ber ku di rêwîtîya xwe da Jaro herçend ku şagirdîya; Zerdeşt, Kawayê Hesinkar, Şêx Hadî, Selahedînê Eyûbî û Ehmedê Xanî kirîye, fikrên wan yên li ser nemirîyê qet pirs nake.

### 2.2.2. Rûpelsazî (Pergala Rûpelan)

Hejmara rûpelên xêzeçîrokên ku di rojnameyan da çap dibin ne pir in. Li hember vê yekê di xêzeromanan da mirov dikare pirtir wêneyan xêz bike (Tuncer, 43). Di *Mirina Jaro* da jî di nav 156 rûpelan da bi tevahî li dora 230 wêneyî hatine xêzkirin. Lewma wexta mirov wêneyan dabeş bike rûpelan mirov dikare bibêje ku hejmara rûpel û wêneyên di *Mirina Jaro* da li gor xêzeromanekê pir in. Ji ber ku di berhemê da behsa pir bûyeran tê kirin zêde wêne jî cih digirin. Di xêzeromanan da xala ku pêşîyê bala mirov dikêşe wêne û reng in. Bi alîkarîya hêmana rengî, berdewamîya bûyera ku di navbera çargoşeyan da hatîye dabeşkirin û nîşandayîna hêmanên sereke pêk dihê (Tuncer, 1993:40-41). Di *Mirina Jaro* da ji bo avakirina atmosferê bi piranî rengê reş hatîye bikarînan. Rengê reş bi piranî; nepenîyê, raz û nenasîyê vedibêje. Herçend ku bikarînana rengê reş tercîheka xêzkar jî be dilê mirov ji alîyê dîtbarî ve *Mirina Jaro* nahebîne.

### 2.2.3. Darêjnivîsa Panoyan

Pergal û bijartina her hêmana çargoşeyên di xêzeçîrokê da ye (Tuncer, 43). Xêzeroman piranî ji çîrokên xwe zêdetir bi karakterê xwe dihê bîra mirovî. Ji bo ku mirov bawerîya xwe pê bîne divê nivîskar bi awayekî baş çavnêrîya karakterî bike. Xêz bixwe sînordanîn e; lewma xetên wê çiqas zelal û herikbar be ji alîyê xwînerî ve dîmen û vegotin dê ewqas baş bên fêmkirin (Ertemir, 2011:103). Li gor vê yekê heke em li *Mirina Jaro* binêrin em dikarin bibêjin, lehengê berhemê Jaro û karakterên din bi

awayekî eşkere nehatine xêzkirin. Xwîner ji xetan tênagihe ka ew karakter di nav kîjan hestan da ne. Xetên wêneyan bi awayekî zelal û bi kûrahî nehatine xêzkirin lewma ev yek wek kêmasîyên berhemê dikare bê nirxandin.

Nivîskar divê rê bide karakteran ku; hest, raman, rewş û bizavên xwe vebêjin. Ev jî bi rêbazên nivîsê yên wek; pifdankên axaftinê, vegotina biqutî, efektên nivîskî û bikarînana bireseran li ser dîmenpiştê, pêk dihên. Divê nivîskar bizane ka nivîsên wî di nav çargoşeyê da wê çiqas cih bigire. Heke vê neke dibe ku bi derbdayîneka zêde mijar bi nivîsan tijî bibe (Ertemir, 2011:106). Di *Mirina Jaro* da li hember vê yekê ji ber ku di her rûpelê da malikek cih digire, bi wêneyan tijî bûye. Lewma ew ji alîyê dîtbarîyê ve wek materyaleka zarokan e.Wek dihê zanîn, di pirtûkên ku ji bo zarokên nû dest bi xwendinê amadekirî da ji nivîsan zêdetir wêne cih digirin. Ji ber van taybetîyên xwe mirov dikare ji bo *Mirina Jaro* bêje ew ne xêzeroman e lê îlustrasyonek e. Îlustrasyon; xêzkirin, ravekirin, şîrovekirin û şayesandina pirtûk, kovar yan jî rojnameyan e. Neqş yan jî wêneyên îlustrasyonê bi şayesandin û ravekirinan wan dîyar û şênber dibe. Lewma îlustrasyon nedîyarîyê dîyar dike, tiştê nayê têgihiştin dide fêmkirin, wê ji nav hêmanên dî cuda dike (Gönüllü, 2017). Jixwe îlustrasyon herî zêde wek şêweyekê hunerê di pirtûkên zarokan da tê bikarînan.




(r.138-139)

Heke em vegerin mijara rêbazên nivîsê yên li jor navbirî divê em bêjin ku di *Mirina Jaro* da wek xêzeromanên din; yekparebûna xêz û nivîsê, dîyalog, cureyên nivîsê yên cuda, binnivîs, efektên dengan, pifdankên hizirkirinê tune ne.

### 2.2.4. Şêwekarî (Stîla Grafîkê)

Şêweya her wênesazî ya xêzkirinê ne wek hev e. Mirov dikare li gor şêweya wênesazî bibêje ka gelo ew wêne li gor mijara berhemê hatine xêzkirin yan na (Tuncer, 43). Li vir ji bo *Mirina Jaro* belku jî bi giştî bo karîkatura Kurdî mirov dikare bêje bi piranî kesê ku xêz dike û dinivîse heman kes nînin. Ji ber vê yekê carinan wêne li gor nivîsê dihên xêzkirin yan jî nivîs li gor wêneyê dihên nivîsandin. Nivîskarê berhemê A. Husên

Kerîm di hevpeyvîneka[10] xwe da dibêje herçend ku di warê xezkirinê da behremendîya wî jî heye dîsa ji bo wênesazîya xêzeromanê ew ne bes e. Lewma ji bo berhema xwe ya bi navê Bazos wî ji 10 wênesazan xwestîye li gor mijara ku wî nivîsîye xêz bikin. Dawîyê wî û wênesazê Romen Florin Gabriel li hev kirîye. Dîsa jî ji ber ku Gabriel ji çanda rojhilata navîn, cilûbergên wan, jîyana wan baş hayedar nebûye encam ne bi dilê wî bûye.

## 2.3. Wekhevî û Cudahîyên Mirina Jaro ligel Xêzeromanên din

*Mirina Jaro* xwedîyê taybetmendîyên xêzeromanên serpêhatî (macera) û dîrokî ye. Em di jîyana rojane da pêrgî bûyerên ku di berhemê da dihên vegotin nayên. Jaro lehengekê mêrxas e, ji hemû xetereyan bi awayekî derasayî xwe xelas dike, di pevçûnan da bi serdikeve. Bi tenê dermanê nemirîyê nabîne. Wek xêzeromanên serpêhatîyê mekan û zeman di *Mirina Jaro* da jî pir caran diguhere. Lê dîsa jî ev alîyên wê ji xêzeromanê zêdetir taybetmendîyên destanê ne. Jaro ji zeman û bûyerekê derbas li zemanekî û bûyereka din dibe lewma em dikarin bêjin ku di *Mirina Jaro* da ji hestan zêdetir tevger hene. *Mirina Jaro* di serdestîya lehengekî mêr (Jaro) da bi hêmanên wek; berpirsyarî, metirsî, guman, mirin, tundîyê dagirtîye.

Di xêzeromanên serpêhatî (macera) da leheng, li hember zordar û nebaşan şer dike, wan têk dibe û wê pergala têkçûyî dîsa ava dike (Tuncer, 1993:31). Em di *Mirina Jaro* da jî vê pêşnûmayê dibînin. Di xêzeromanên modern da têkoşîn li hember; hutan, zanyarên sûtar, robotan û serbazên Nazîyan dihê kirin (vgz. Tuncer, 1993:76, A. E. Pretince). Di *Mirina Jaro* da Jaro li hember; Dehaq, Ehrîman, Xaçperestan û Bekoyê Ewan şer dike.

Di xêzeromanan da xetên rûyê lehengê qenc û leşê wî jî nîşan dide bê ka ew mirovekî çawa serkeftî ye û baş e lê wexta em li Jaro dinêrin, wek li jêr jî xuya dibe, herçend ku ew lehengekî qenc e wek kesekî nebaş hatîye xêzkirin.




(r.146-147)

[10] http://www.ufkumuzhaber.com/kurt-generali-bazos-3289h.htm (Dema Jêgirtinê 25.07.2019)

Çawa ku xêzeromanên li Amerîkayê ji alîyê mijarên sereke, model û hêmayan da ji çanda kowboyan sûd girtîye (Tuncer, 1993:32), *Mirina Jaro* jî bingeha xwe ji bûyerên mîtolojîk, dîrokî yên rojhilata navîn girtîye. Di edebîyata welatên din da jî gelek xêzeromanan ji folklora xwe sûd girtine. Yek ji bingeha janrên edebîyata modern ya Kurdî zargotina Kurdî ye. Em di nimuneya ewil ya xêzeromana Kurdî jî da vê yekê dibînin. Lewma weku berîya niha jî me dîyar kir *Mirina Jaro* jî wek destanekê hatîye nivîsandin.

Di xêzeromanên dîrokî da bi piranî hêmanên erotîk hene lê di *Mirina Jaro* da em vê yekê nabînin. Piştî Anahîta Jaroyî ji Gilgamêş dûr dixe û wî ber bi evînîyê ve dikêşe Jaro "heft salan gîsin li xakê dimeşîne û heftê salan tovê evînê direşîne" (r.32). Hema bêje dilê wî nerm dibe, bi evînî vedije wê gavê jî Yezdan tofanê digerîne. (r.34) Keçeka din ya "delal û nazenîn" bi navê Dinya dixwaze ligel Jaro nemîrîyê parve bike. Jê ra dibêjê heke Jaro hejê bike ew ê sêhra nemirîyê bidê û heta hetayê wê bihevre bijîn. Wexta Jaro jê ra dibêje "Ma çawa wê sebra min bê?" Dinya wiha bersivê dide wî:

*"…Ez ê bidim te du tajî û tolan*

*Tu bike nêçîra kew û xezalan*

*Ku roj çû ava bû şev li min û te*

*Em ê bikin kêfê heft xwezî bi te…"* (r.91)

Di *Mirina Jaro* da wek xêzeromanên din hejmara karakterên jin kêm in û bi piranî ew di berhemê da wek hêmanên alîkar cih digirin.

Nivîskar hêmaneka ku di mîtolojîya Rojhilat û Rojava da baş dihê zanîn dubare dike. Wate, di mîtolojîya civakên serdema berê da behsa rêwîtîya nemirîyê dihê kirin. Jixwe çavkanîya vê jî destana Gilgamêşê ya Sumerîyan e. Ji bilî vê di mîtolojîya civakên serdema berê yên weku; Babîlî, Yewnanî, Romayî, Misirî û Fenîkeyîyan da jî em pêrgî heman mîtê dihên. Bi bawerîya van civakên berê hin hêmanên weku nebat, sewal û avê bi taybetmendîyên xwe yên derasayî nemirîyê didin jîndaran. Weku sembolên nemirîyê di nebatan da; gîhayê jîyanê, kivark, sêv, mêw, dara jîyanê, di sewalan da; mar, dûpişk, şeytanok hene (Kılıç û Eser, 2017).

Ji bilî mîtolojîyê wekhevîyeka dî ya Mirina Jaro ligel xêzeromanên cîhanê heye. Ev berhem ji ber armanceka sereke hatine nivîsandin. Di *Şerê Cîhanê yê Duyem* da dewletan bi alîkarîya xêzeromanên xwedî lehengên derasayî xwestin propagandayê bikin, bandora şerî ya nebaş nîşan bidin û gelê xwe bikin yek (Cantek, 2014:12). Di *Mirina Jaro* da armanca nivîsandina pirtukê di pêşgotinê û di encamê da wek "xizmeta ji bo Kurdî" hatîye dîyarkirin;

*"…Bo xizmeta Kurdî me bi rê ketî*

*Qet nîne tişt ji bilî vê niyetê…" (r.5)*

*"…Me, bo we hîkaye kir vê qisse tê*

*Hêvîdar in dê bighêjê meqsedê*

*Hêvî; ji Kurdî re bikê xizmetê*

*Mebest; ku em jê bigrin nesîhetê…"* (r.156)

Nivîskarî, bi tenê nexwestîye Jaroyî wek karakterekê xêzeromanê ava bike. Di heman demê da wî erkeke din jî dayîyê. Jaro, şagird û rêhevalê; Zerdeşt, Kawayê Hesinkar, Şêx Hadî, Selahedînê Eyûbî û Ehmedê Xanî ye.

Bi bawerîya Levent Cantek di berhemên edebî da yek ji motîfên aksîyonê yên herî sereke "şûr" e. Ew di navenda her cure rapêşîyên lehengî da cih digire. Li çîrokên ku behsa şerên bi şûran dihê kirin li rexekî; mirin, berpirsyarî, rêzik li rexê dî kelecan, evîn, bengîtî heye (Cantek, 2014:224). Di *Mirina Jaro* da jî şûr motîfeka girîng e. Jaro, bi şûrê xwe dijminan dikuje. Dilo ji ber bêbextîya jina xwe bi şûrê xwe birayê xwe Lewendo birîndar dike. Piştre wexta rastîyê hîn dibe jina xwe bi heman awayî dikuje.

**2.4. Zimanê Berhemê û Hêmanên Mekan û Zemanî**

Di gelek malikan da em dibînin nivîskarî ji bo ku serwayê xira neke rêzikên rêzimanî piştguh kirîye. Wek mînak di pêşgotinê da; "*Bo xizmeta Kurdî me bi rê ketê/ Qet nîne tişt ji bilî vê niyetê* " tê gotin. Li vir ji ber ku hevoka duyemîn bi peyva *"vê niyetê"*xelas bûye nivîskarî di dawîya hevoka yekemîn da *"rê ketê"*nivîsîye lê belê li gor dema borîya têdeyî heke cînavka hevoka ewil "em" be divê ew bi awayê "em bi rê ketin" hatibûya nivîsandin. Nivîskar ji bo ku serwayê li hev bîne ew weku "me bi rê ketê" nivîsîye.

Herçend ku di xêzeromanan da carinan pirole û dubare bên kirin jî ji ber ku di *Mirina Jaro* da ev pir zêde hatîye kirin vê yekê xisar daye berhemê. Bêguman ev hinek jî ji ber nivîsandina berhemê bi awayekî destanî pêk hatîye.

Di xêzeromanan da bi awayekî dîtbarî pêşkêşkirina mekanî li gor dîyarkirina zemanî hêsantir e. Wexta xwîner dinêre fêm dike ka bûyer li daristanekê, bajarekî yan jî li cihekî din rûdaye. Lê di vegotina "mekanên fireh" da carinan dîmeneka panoramîk yan jî xêzkirina avahîyan wê atmosferê pêk naîne. Ji bo ev tevlihevî ji holê bê rakirin divê sembolên sereke yên bajêr bên bikarînan (vgz. Topkaya , 2014:40, Kireççi).



(r.8)

Jaro ji Cizîrê dikeve rê, piştî rêwîtîyeke dûr û dirêj ew dîsa dizivire li Cizîrê. Li gor nirxandina Kireççi di destpêka *Mirina Jaro* da mirov hêvî dike ku wek “mekanekî fireh” di wêneyê da semboleka ku Cizîrê bi bîr tîne bê xêzkirin. Wexta mirov li wêneyê jor dinêre bê ka ew avahî çi ye? Mînaka ku herî pêşîyê bê bîra me Keleha Cizîrê ye. Lê di vê wêneyê da tiştê dihê dîtin zêdetir dişibe şatoyekê yan jî perestgehekê.

Wekî li jorê jî hate destnîşankirin di xêzeromanan da bi piranî hêmana zemanî nedîyar û bêsînor e. Nivîskar bi dilê xwe ye ku di heman demê da behsa rabirdûyê û paşerojê biket (Topkaya, 2014:40). Her wiha di destanan da jî hêmana zemanî zêde dîyar nîne. Li gor vê qayîdeyê di *Mirina Jaro* da jî bi piranî hêmanên wek; heft sal, heftsed sal, heft hezar sal dubare dibin. Wexta Jaro ji mekanekî û bûyerekê derbas li yekî din dibe em van qalibên zimanî dibînin. Rêwîtîya Jaroyî ya di dîroka Kurdan da jî kronolojîk nîne. Wek mînak; wexta Jaro şagirdê Şêx Hadî ye (P.Z. 1160) em dibînin ew çûye bûye şagirdê Kawayê Hesinkar (B.Z. 612). Ev yek jî vê berhemê ji cureyeka modern zêdetir nêzikî folklorê dike. Di xêzeromanan da zeman, ji hêmanên deng û îmajê tê fêmkirin (McCloud, 2019: 116). Di *Mirina Jaro* da pifdankên axaftinê yên ku dengan bi bîr tînin û efektên dengan tune ne têgeha zemanî di berhemê da bi awayekî dîtbarî nayê fêmkirin.

## ENCAM

Dîroka xêzeromanê wek janreka hunera vegotinê bi awayekî modern ligel çapxaneyê dest pê dike. Dîroka çapxaneyê li nik Kurdan ji ber şertûmercên sîyasî û aborî dereng dest pê kirîye. Girêdayî vê yekê, di teknîk û pisporîya çapxaneyê da jî ev astengî hene. Ji ber van sedeman wek janrên din yên edebî û hunerî di edebîyata Kurdî da nimûneyên ewil yên karîkatur û xêzeromanê jî gelek dereng derketîne holê. Karîkatur jî, ku çavkanîyeka sereke ya xêzeromanê ye, heke em mînakên di *Ronahî*yê da nehesibînin bi awayekî tekûz piştî salên 1980’yî di weşanên Kurdî yên li Ewropayê da dihên dîtin. Herçend ku rêjeya xwendewaran di nav Kurdan de pir nîne jî di çapemenîya Kurdî da me dît ku ji xêzkirinê, xêzeromanan û karîkaturan zêdetir nivîsan cih girtîye. Ji ber vê yekê ev mijar ji mînakên li cîhanê, nemaze ji Amerîkayê, cuda ye.

Yek ji nimûneyên ewil yên xêzeromanê di Kurmancîyê da *Mirina Jaro* ye. Ji ber vê ewilbûna wê girîngîya berhemê zêde ye. Dîsa ji ber heman sedemê di berhemê da dijalî û kêmasî dihên dîtin. Ev berhem pêşîyê li tu cihan nehatîye weşandin. Piştî ku nivîskar wê dinivîse dide xêzkarî. Ew jî li gor naverokê nivîsê xêz dike. Ev rêbaz heta demeke dirêj di karîkaturên Kurdî da jî hate bikarînan û hê jî berdewam dike. Ji ber vê rêbazê rêzika ewil ya xêzeromanê, ango yekparebûna xêz û nivîsê di *Mirina Jaro* da têkçûye. Çend hêmanên sereke yên wek; pifdankên axaftinê, qutîyên ravekirinê, efektên dengan, cureyên nivîsê yên cuda, binnivîs, dîyalog divê di her xêzeromanê de bên bikarînan em van di *Mirina Jaro* da nabînin. Ev hêmanên navborî xêzeromanê ji cureyên dî yên bi têkildarî xêzkirinê cuda dike lewma hebûna xêzeromanê girêdayî van hêmanan e. Ji ber tunebûna wan mirov nikare Mirina Jaro weku xêzeromanekê bipejirîne. Ji ber heman sedeman, wate ji ber tunebûna pifdankên axaftinên efektên dengan hêmana zemanî jî ji alîyê dîtbarîyê ve nayê fêmkririn. Mekanên ku tên behskirin û yên di wêneyan da hatine xêzkirin jî ji hev dûr in.

Deqa *Mirina Jaro* bi helbestkî hatîye nivîsandin. Ji ber ku di her rûpelekê da malikek û bi piranî ji yekê zêdetir wêne hene di *Mirina Jaro* da hejmara xêzewêneyan pir lê ya nivîsan kêm e. Lewma ew ji alîyê dîtbarîyê ve dişibe pirtûkên zarokan yan jî helbestên

biwêne. Ji ber van taybetmendî û kêmasîyên xwe mirov nikare bibêje ku Mirina Jaro xêzeromanek e; lewma ew yek ji mînakên îlustrasyonê ye. Herçend ku îlustrasyon ravekirin û dîyarkirina nivîsarekê ye ev rêzik di Mirina Jaro da hatîye binpêkirin. Dîsa em dikarin bibejin ku xêzkirina Mirina Jaro; bêpergal, bêdêhn û bêkûrahî ye. Di xêzeromanekê da yek ji hêmanên sereke dîtbarî ye lê di *Mirina Jaro* da em rûyê karakteran baş û zelal nabînin. Ev ji bijartina rengan û taybetmendîya wê ya xêzkirinê pêk tê. Lewma di Mirina Jaro da di bijartina rengan da jî nelihevîyek heye. Piştdîmena pirtûkê bi giştî bi rengê reş hatîye rendangin. Ji ber vê yekê xêzên nedîyar û ji kûrahîyê dûr ligel rengê reş dibe sedema nedîyarîyê. Dibe ku ev yek ji şêweya xêzkarî pêk hatîye lê dîsa jî haya me ji hest û ramanên karakteran tune ye. Ji ber vê yekê weku îlustrasyonekê Mirina Jaro li hemberî armanca qayîdeyên îlustrasyonê yên dîyarkirin, şayesandin û ravekirinê hatîye xêzkirin.

## ÇAVKANÎ


Baykuş, Özlem. *Çizgi Romandan Sinemaya Uyarlamada Karaoğlan Örneğinin Plastik Değerler Bakımından İncelenmesi*. İstanbul: Maltepe Üniversitesi Sosyal Bilimler Enst. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, 2016.

Bıçakçı, Ezgi. *Çizgi Romanın Tarihsel Düzlemde Baskı Sanatları ile Kesişimi.* Eskişehir: Eskişehir Anadolu Üniversitesi Güzel Sanatlar Enst. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, 2018.

Boyce, Mary. *A History Zoroastrianism.* Netherland: E.J. Brill, 1982.

Cantek, Levent. *Türkiye'de Çizgi Roman*. (Çapa Çarem) İstanbul: İletişim Yayınları, 2014.

Collins, Andrew. *Meleklerin Küllerinden Günahkar Bir Irkın Yasaklanmış Mirası.* Çev. Zafer Avşar. İstanbul: Avesta Yayınları, 2001.

Elî, Mamê û Lewend Ozkan. *Mirina Jaro*. Îrfan Karaca (Ed.). İstanbul: Weşanên Berçem, 2007.

Ertemir, Ersin. *Yükseköğretimde Yöneticilik Eğitimi ve Yeni Bir Öğretim Yöntemi Olarak İnteraktif Çizgi Roman: Yöntemin Yarattığı Faydalılık Algısı Üzerine Bir Araştırma.* İstanbul: İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enst. Yayınlanmamış Doktora Tezi, 2011.

Gameson, Richard. *The Study of the Bayeux Tapestry.* The Boydell Press: Woodbridge (UK), 1997.

Gönüllü, A. Betül. "İllüstrasyon (Resimleme) Sanatını Tanımlamak", *Muğla Sıtkı Kocaman Üniversitesi II.Uluslararası Felsefe, Eğitim, Sanat ve Bilim Tarihi Sempozyumu,* 03-07 Mayıs, Tam Metin Bildiri Kitabı, (2017): 909-919.

Gündüz, Uğur. *Bir Popüler Kültür Ürünü Olarak Çizgi Romanın Kültürel, Toplumsal ve Siyasal İşlevleri.* İstanbul: İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enst. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, 2004.

Hassanpour, Amir. *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil (1918-1985).* Çev. İbrahim Bingöl ve Cemil Gündoğan. İstanbul: Avesta Yayınları, 1997.

Kılıç, Y. ve Elvan Eser. "Eskiçağ Toplumlarının Mitolojisinde Ölümsüzlük Arayışı (Ölümsüzlük Sembolü Olarak Bazı Bitki, Su ve Hayvanlar)", *Akademik Tarih ve Düşünce Dergisi*, 4/3 (2017): 122-156.

Kolektîf. *Kitêbî Yekemîn Dîdarî Nêvdewletî Kartonî Kurd*. Silêmanî: Çapxaney Çarçira, 2019.

Kutlay, Naci. *21. Yüzyıla Girerken Kürtler*. (2. Baskı) İstanbul: Pêrî Yayınları, 2011.

McCloud, Scott. *Görünmez Sanat Çizgi Romanı Anlamak.* Çev. M. Cem Ülgen. 2. Baskı, İstanbul: Sırtlan Kitap, 2019.

P. Speidel, Michael. *Ancient Germanic Warriors (Warrior styles from Trajan's Column to Icelandic Sagas).* Routledge: London and New York, 2004.

Seyhan, Ekin Can. *Superman Çizgi Romanlarındaki Tasarım Unsurlarının 1938-2014 Yıllarındaki Değişimleri.* Ankara: Başkent Üniversitesi Sosyal Bilimler Enst. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, 2015.

Topkaya, Yavuz. *Vatandaşlık ve Demokrasi Eğitimi Dersinde Eğitici Çizgi Roman Kullanımının Bilişsel ve Duyuşsal Öğrenmelere Etkisi.* Erzurum: Atatürk Üniversitesi Eğitim Bilimleri Enst. Yayınlanmamış Doktora Tezi, 2014.

Tuncer, Nilüfer. *Çizgi Roman ve Çocuk.* İstanbul: Çocuk Vakfı Yayınları, 1993.

## KOVAR Û ROJNAME

Bozarslan, M. Emîn. *Jîn (1918-1919)*. Uppsala: Weşanên Deng, 25 (1985).

________________. *Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi (1908-1909).* Uppsala: Weşanên Deng, 1-4 (1998).

Ceweri, Firat. *Hawar Cild 1:1-23, Cild 2:24-57.* Stockholm: Weşanên Nûdem, 9-11-13-42 (1998).

Jiyan, Rênas. *Ronahî (1942-1945)*.Çapa Sêyem, Diyarbakır: Weşanên Belkî, 13-15-16-19 (2010).

Kolektîf. *Tirêj (Kovara Çandî û Pîşeyî).* İzmir: Doğan Basımevi, 1-2-4 (1979-1981).

Meretowar, Ayhan û Yên Din. *Rojî Kurd (1913)*. İstanbul: Weşanên War, 1-2-3-4 (2002).

## ÇAVKANÎYÊN ONLINE

Govarî Gep, http://gep-media.net/ (Dema jêgirtinê: 05.07.2019)

Govarî Tan Tan, http://www.tantan.8m.net (Dema jêgirtinê: 05.07.2019)

Kerîm, Ali Husên. http://www.ufkumuzhaber.com/kurt-generali-bazos-3289h.htm (Dema Jêgirtinê: 25.07.2019)

Yeşîlmen, Dawid. “Kürtçe Dergicilik”, http://www.kurdilit.net/?page_id=2501&lang=tr (Dema Jêgirtinê: 23.07.2019)